

P
D
P
K
S



GULISTAN



Bîranîna 24 sal li ser koçberiya Cegerxwîn

Kovarek Wêjeyî û civakî ye
Hijmar 38 Payiza 2008

Kaniya Helbestan

Li Rojhilat




Cegerxwîn

Ev wêne ji Rojnama Agrî Hijmar 97- 2008

GULISTAN

Kovarek Wêjeyî û Civakî ye



*Ev kovar kovara te ye
Ev bax û gulîzara te ye
Têde darek xwe biçîne
Ev dar nivîsara te ye*

Cegerxwîn

**Di sala 1968an de
Cegerxwîn
Kovara Gulistan
Damezirandiye û bûye berpirsyarê wê**

**Hijmar 38 payiza 2008z
Wênaya qapa dawî honermend : Malva**

*Ji bo nameyên we ev email heye :
gulistan38@gmail.com*

Şîna Cegerxwîn

Henefî Çelebî

Seydayê Cegerxwîn şeva 22.10.1984 li Stokholmê çû ser dilovaniya xwedê, Cenazê wî roja îne 2.11.1984 ji stokholmê bi merasîm rakirin . welatparêzên kurd ên ji çend welatên ewropayê ji hatin, di nav wan de Sermiyanê Enstîtuya Kurdî, di merasîmê de hazir bûn û li hozanê mezin silava dawî kirin. Paşê , li ser wesiyeta Seyda , cinaze şandin Sûriyê. Rojnamevanekî kurd ku ji bo şîna Seyda çûbû Sûriyê ji xwendevanên me re qala vê bûyera dîrokî dike .

Şeva 4.11.1984 ,sa,et dora 21an. salona bendemayînê ya balafirgeha Şamê ji qasî hezar welatparêzên kurd û nûnerên tsşkîlatên Kurdistanê tijî bû. Danîna balafira ku cenazê hozanê kurd ê mezin Cegerxwîn ji Stokholmê di anî Şamê îlan kirin . weşkî bi şûnde xortên kurd – xortên hêviya Cegerxwîn – cenazê,weka ku çûkek sivik hilgirin, li ser milên xwe kirin û anîn nav qelebalixa bendewar. Pê re tabûtê bi gul û kulîlkan xemilandin ,di ambolansê de bi cih kirin .nîvê şevê ambolansa bi cenaze barkirî kete ser riya Qamişlo .

Wê şevê xelkê Qamişlo ranezabûn.Lempekên hemû malan vêketî bûn .her kes li hêviya helatina rojê bû ,kar,xwendegah,wezîfe, nedihat bîra kesî . xelkê Qamişlo di nav hestekî wisa de bû ku gotina wî diware. ewê cenazê hozanê xwe yê mezin Cegerxwîn li ser destê xwe hilgirin .Ewê bi sed hezaran kes bi hev re bi qêrîna ((Cegerxwîn nemirye

! Cegerxwîn namire !)) û bi vî awayî nemirinya Cegerxwîn di dîrokê de binivîsandina . û xelkê qamişlo , wekî ku bixwaze xelkê bajarên kurd ên din têxe hesûdiyê , tişteki kubar bû .

ji çiyayê Kurmênc ta Dêrikê gelê kurd ê welatparêz ketibû ser riya Qamişlo.

Her welatparêzê kurd dixwest nîşn bide ku Cegerxwîn ê ku kaniya ramana (fikra) welatparêziyê bû , bûye nemir .

Bi hilatina rojê re cenaze gihişte axa Kurdistanê.li wê derê gelek kes, ku di nav wan de Sekretêrê Giştî yê Partiya Dîmoqrati pêşverû kurd li Sûrya , Hemîd Derwêş jî hebû ,li benda cenazê bûn ,Nêzîkî bajarê Heseke bû-bûn . Saet li dora 10 a cenaze , tevî konvoyek dirêj kete Heseke . Bi hezaran kurd cilên xwe yê neteweyî li xwe kiribûn û li herdû aliyên kolana sereke ya bajêr û heta dervayî bajêr rawestiya bûn, li cenazê silav dikirin .Keçan cilên sor û zer û kesk li xwe kiribûn , sê bi sê komikan çêkiribûn û bajarê hesekê dixemilandin .

Di nivê riya Heseke – Qamişlo (80 km) konvoyek 20 km li dû ambolansa cenazê pêk hatibû . Heya Qamişloyê xelk li qiraxên rê civya bûn, li cenazê silav dikirin û diketin nav konvoyê de . li gund û bajarokan wesît nemabûn . hemû wesît, traktor, kamyon, otobîs, bîkap û erebe ketibûn ser riya Heseke –Qamişlo . waliyê Heseke ji Qeymeqamê Qamişlo re telîfon dike digotê : lehiya mirov û wesîtan ji Heseke rabû ber bi Qamişlo tê ,bila hayê te jê hebe !

Berê nûçe hatibû belav kirin ku ewê cenaze roja 5.11.1984 di saet 9an de bighê Qamişlo .û bi sed

hezaran kes* sibê zû li dervayî bajêr civyabûn ,çavên wan li rê bûn, kes li nav bajêr nema bû, te digo qey Sendîkayeke xurt biryara giraveke giştî daye û li derveyî bajêr jî xelk cejna newrozê pîroz dike.

Dawiyê cenaze saet li dora 15 a tevî bêtirî 50 hezar kes xuya kir ,sed hezarên ku bendewar bûn jî tevî wan bûn . dengê ((Cegerxwîn nemirye ! Cegerxwîn namire !)) li hawîr belav bûn .xelkê dest pê kir cenazê tevî ereba wî rakir hewayê û hilgirt .

Teşkilatên kurdî ên ku merasîma cenazê amade kiribûn îdî nikaribûn vî mexlûqatî kontrol bikin . xelkê kontrol girt destê xwe û bi dispilîneke mezin dest bi meşê kir . li pêşya sed hezaran, bi hezaran xortên kurd ,ên ku cilên xwe ên netewî li xwe kiribûn , di destê wan de wêneyên Cegerxwîn ê çeleng ,şerîteke çend kîlomitir pêk anîbûn û ber bi mala Cegerxwîn dimeşyan, kuçe û kolanên Qamişlo têra van sed hezaran nedikir.

Li ser wesiyeta Cegerxwîn cenazê wî di baxçê mala wî de veşartin . li ser gorê Sekretêrê Giştî yê Partiya Dîmoqrati Pêşverû Kurd li Sûryê Hemîd Derwêş û Kerîm Ehmed endamê polîtburoya Partiya Komonist a Îraqê gotar gotin. Civîna bi bîranîna Cegerxwîn li Qamişlo hefteyekê dom kir .

H.C *

Ev gotar di Kovara HÊVÎ , Hejmara 3 / SEBAT 1985 , belav bûye

* li gora texmîna dora 300 hezar kes beşdarî merasîma cenazê Cegerxwîn bûn . li tevahiya bajarên kurd ên din ên Sûryê û wisa li şam û Helebê jî civînên ji bo bîranîna Cegerxwîn hatin çekirin . li dervayî welêt jî civînên bîranînê li

Stokholm,Parîs,Moskova,Lênîngrad,Sydney,koln,û hê gelek bajarên din ê Awrûpayê hatin pêkanîn .

* H.C ew bi xwe : Henfî Çelebî ye bi cenaze re ji siwêd hatibû , (ev ronkirin ji Gulistan hate danîn)

Bi zimanê xwe bixwînin

Selman Heso

Gotinek dîrokî û pir giring bû çaxa **D.Nûredîn Zaza** di pêşgotina dîwana seydayê Cegerxwîn de nivîsî , dibêje :

(*Gelî Kurdan!*

Eger hûn naxwazin ji hev toromar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin nas kirin û hez kirin, û bi hevaltî û dostaniya milletên din re pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.)

Bi rastî , ev şîret hîna jî gelek lazime bighê guhê xelkê me , ji ber ko eger em bi vê şîretê nekin zimanê me di xeterek mezin deye, xwendin û nivîsandin bi zimanê kurdî zimanê me diparêze ,û hebûna milletê me û nasnama wî diparêze, ev mesele divê bimîne li ber çavê her yekî ji lawên milletê me , divê em kar bikin ku ziman winda nebe , û divê em ji bîr nekin bê dijminê kurd çiqasî şerê zimanê me dike ,qedexe dike , heta gotina (kurd)



nahêle bê gotin . dijminê kurd zanin ku zimanê me winda bibe hebûna me jî wek netewe winda dibe .

Ev giringiya ziman ne her kesî pê zanî bû , ne her kesî pê bang kir, hindik bûn ewê ev rastî bîr dibirin di demekê de ku mesela netewa kurd li nav milletê me hîn di destpêkê de bû , jimarek hindik bûn yê ku rahiştin mesla ziman û dan nivîsandin û xwendin bi taybet malbata Bedirxan , ewana rojname çapkirin,rêziman çêkirin ,li Şam û Beyrûtê di salên 1931 heta 1946 gelek belavok û kovar çap û belav kirin, bi vê pêlê re xwendin bi zimanê me fireh belav bû , di vî warî de seydayê Cegerxwîn jî wek qehremanekî ji nav rêza milletê me berz û bilind bû ,dîwanê wî û helbestê wî bûn wek çira ruhnî dan û xelkê me şiyar kirin li ser giringiya ziman ..

Di pêşya damezrandina partî de sala 1957 bi zimanê kurdî belavok û dîkomentê xwe bi kurdî derdixist ew gavek gelek hêja bû, mixabin pişt re hat li paşxistin, nemaze piştî ku destê perçekirinê kete nav partiyê, bêtirê belavoka bûn bi (*Erebî*) , heta sala 1968 ku dîsa seydayê Cegerxwîn kovara (**Gulistan**) derxist bi Alikarya partiya me .

Disa jî mirov dikare bibêje : tev li kêmasiyê ku tevgera me kirine , lê divê em bi heqê tevgera xwe rûnên û jêre bikin nîşanek serbilindiyê , ji ber ku ziman da nasîn bi xelkê me û hişt ku ji zimanê xwe hezbikin û pê bi axivin li malê ,zarokên kurda hînî zimanê dayikê bibin û pê serbilind bin ,tu kare bêje ku li nav kurdê Sûrya xelk gelek kêmin ewê ku li zimanê xwe nabin xwedî, heger yek-libin wilo

hebin jî dibin cihê seravde û şermezariyê di nav xelkê de .

Ev encama mezin pêk nedihat eger ne tevgera siyasî ya kurdî ne li pişt ba, ji ber ku li vî welatî zorek mezin dijî ziman heye, ew dijwarî pir tirsê hîna jî liser hebûn û mana zimanê kurdî dihêle, di vê babetê de lêkolînavan R.L.Tisabolov , dibêje :
(zimanê kurdî li sûryê de bi mîrî ve pê nehatiya birûniştin,herweha jî di dibistan û destgehê zanistî de pê nayête bi xwendin,wisa jî bi zimanê kurdî ne nivîst,Rojname û kovar jî têtin biderketin . hîç li wê derê bi zimanê kurdî ne weşandineke Radyo û ne jî ya televizyaonê tête bi dîtin . wiha jî bi karanîna zimanê kurdî di dam û destgehên dewletê de nav nahêlin pê bête bidan) (Berlin ,di 17.12.1987 de)

Di bin vê zordestiyê de ya ku li tu dera dijayetiya ziman wilo peyda nabe ;kurd karîbû zimanê xwe bi parêze ,niha jî ji hemû kesê welatparêz tê xwestin têkevin nav vî karê pîroz , karê parastin û pêşxistina zimanê kurdî .

Îro jî divê keç û lawên milletê me bi xurtî piştgirya hînkirin û nivîs û xwendina bi kurdî bikin , bihêlin biçûk û mezin bi kurdî biaxivin,bixwînin û binivîsin . di vî warî de hin deryê nû ji mere vebûne wek bikaranîna Entitnêt û belavokê Eliktronî ko roj bi roj mumkine xelkê me wî dîwarê ko li pêşya çapemeniyê hukûmet datîne bişkîne , em karin ji vê riyê pir fêde bikin di warê ziman de .

Qamişlo 15/10/2008

(zînarî erebî) .. hevîgirtîna niştîmanî li Sûriyê dide ber herîfandîne

Elî Şemdîn

Ji dema ku mîletê kurd hatiye girêdan bi dewleta sûryê ve, li gor Peymana (Saykis-Pîko) sala 1916 , ji wê demê ve xebata xwe berdewam dike ji bo parastina nasnama xwe ya netewî , û ji bo ku cihê xwe yê durust bigire di hundurê welêt de di bin siya sazûmanek dîmoqratî nûjen de , da ku mafên xwe yê netewî bide parastin .



û bi rastî jî mîletê kurd roleke giring lîstîye di avakirina dewleta sûryê de ku di bin nîrê ferensîyan de bû li seranserî nivê pêşî ji sed sala bîstan ,û qurbaniyên hêja pêşkêş kirine ji bo pêkanîna azadî û serxwebûn û pêşketina sûryê , lê mixabin hêzên şovînistî ji vê rolê ne razîbûn , û hêdî hêdî piropoganda û derew li dor vê rolê belavkirin û gotin ku kurd xeterekê li ser ewlekariya welat çêdikin , û nerînên tijî kîn û zikreşî li dijî kurd dane eşkerekirin û belavkirin , û hebûn û taybetmendiyên wî yê netewî dane inkarkirin , û ev mêjiyê nijadperest hate eşkerekirin yekemîn car di destûra Partiya (BE'ES) de ku eşkere dibêje : çî kesê ku bi zîmanê erebî bi axive , ew dibe ereb , û

çi kesê li derveyî vê nerînê bimîne divê were
koçbarkirin û dûrxistin ..

Û ev piropoganda şovînî li dijî milletê kurd li sûriya
û li dijî rola wî a niştimanî ya bi rûmet gihişte wata
herî bilind di salên şêstî de ji sedsala bîstan , dema
ku efserê ewlekariyê (Mihemed Teleb Hilal) ,
serokê beşê siyasî li parêzgeha hesekê (Cezîrê)
lêkolînek xerab amade kir li ser Cezîrê ji aliyên
(netewî , siyasî ,û civakî) ve , kîn û berberî jê
difûriya li dijî kurd, û bi wê nerînê di xwest
dîwarekî ji xelkên ereb ava bike di nav bera xelkên
milletê kurd de yên ku sînorên (Saykis –Pîko) berê
ew ji hev qetandibûn, û wan ji herêmên wan yê
resen bidin koçbarkirin û ereban li şûna wan cîbicî
bikin ji bo ku dîmografiya wan herêmên ku bi
piraniya xwe ve kurdin , bidin guhertin , û di wê
lêkolînê de dabû nîşandan ku kurd dixwazin welatê
sûrî bidin parçekirin û dewleta israîl ya diwemîn
bidin çêkirin ,û bêbextî û derwên din jî di gotin , ji
bo gurkirina cemawerên ereb li dijî birayên wan ên
kurd ev ji aliyekî ve , û ji aliyên din ve peydakirina
behana ji desthilatên şovînî re ku êrîşan bidne ser
wê (xeter) a ku di mêjiyê xwe de çêkirine ji bo
qirkirina kurdan , û bi rastî jî wî efserê şofînî çend
pêşniyarên mîna jehrê ji serokatiya dewleta xwe re
pêşkêş kiribû ku bi pêkanîna wan pêşniyaran wê
karibin kurdan ji kok de rakin , ewî di wê lêkolîna
xwe de di vê derbarê de ev gotiya : (pirsgirêka

kurdî îro , ku xwe sazkeriya , wek nexweşiya penceşêre , çêbûye yan hatiye çêkirin di parçekî de ji laşê netewa erebî de , û tu derman jêre tune ye ji bilî jêkirinê pêve).

Û ji nav pêşniyarên ku (Mihemed Teleb Hilal) pêşkêşî serokatiya xwe kiriya ev xala (8) ye, ku di bêje: (bi cî kirina xelkên ereb yê netewperest di herêmên kurdî de li ser sînor, ji ber ku ewê bibin dîwarek di pêşerojê de dinavbera kurdan de û wisa jî wê bibin çavdêr jî li ser wan, ta ku werin barkirin bi yek carê re ..). Mixabin ew pêşniyarên kirêt û rûreş hatin qebûl kirin ji alî desthilatên şovînî ve wek pirograma kar , û li ser erdê bi kar anîn di riya zincîrek ji pirojeyên şovînî û siyasetên dijî maf û yasayên lîsta mafê mirovan û peymanên navdewletî ku ji alê dewleta sûryê ve jî hatine imzekirin , û (hejmartina awarte 1962), û (zinara erebî) xirabtirîn piroje bûn ji wê lîstê û ziyaneke mezintirîn gihandin nasnama netewî ya miletê kurd ..

loma (zinara erebî) yek ji pêşniyarên Mihemed Teleb Hilal bû ku desthilatên sûrî di 1966 an de dest bi cî bi cî kirina vê pirojeyê kiribûn wek qonaxa yekem , ku dest danî bûn ser baştirîn zeviyên çandiniyê li cezîrê yê ku cotkarên kurd ji bav û kalan ve bi xwêdana xwe av didan û cot dikirin , li seranserê sînorê sûryê bi sînorê turk û

Îraqê re , û ew zinar destpê dike ji (Eyindîwar) li ser çemê Dicle , ta bigihe (Serê Kaniyê) ji aliyê rojava ve, bi ferehbûna (10-15)kîlomitir û bi dirêjhiya (375)kîlomitir , ev zevî û qad ji cotkarê kurd hatin sitandin bi behana avakirina komelgehên çandiniyê li gor nimûnên (Sovxoz û Kolxoz)ên soviyetî ku laşkergehê sosiyalistî piropogandek mezin jêre kiribû û bi xurtî li kêlekê disekinî li dijî cotkarên kurd ku vê zinara erebî ew bê qada hiştibûn , û wê demê Elmaniya rojhilat ew cotkar didan nîşandan wek kevneperest û nokerên sehyûnizmê ji ber ku li dijî guhertinên sosiyalistî di sûriya de disekinî li gor dîtina wan .

Û li ser bingeha biryara serokatiya Be' es (Qiyada Qutrî), ya dibin jimara (521 / 24-6-1974) , desthilata Sûryê di sala 1974 an de dest bi pêkanîna qûnaxa diwem ji (Zinara Erebi)kir bi anîna (4500)malên Erebi ji dervî parêzgeha Cezîrê , ji parêzgeha (Heleb , Reqa) ew anîn û li (39) gundên nûjen ku dewletê ji wan re avakiribûn ew bi cîkirin di seranserê wê zinara erebî de , û ew zevî li wan belavkir ku jimara wê digihişte (800 00) donim , yanî her malek erebi ji (150-300)donimî zêdetir sitand , û hemî pêwistiyên jiyanî ji wan re berdest kirin di wan gundan de .

Û ev piroje hîn jî berdewame bê rawestan ta roja îro jî , ku vê dawiyê desthilata sûryê dest bi

pêkanîna biryarekê kiriye ku (150)malên ereb ji başûrê bajarê hesekê ji navçeyên (Şedadê û çiyayê ebdul ezîz)bînin herêma kurdî (Dêrikê)wan bi cî bikin û zeviyên mayî ku berê ji kurdan sitandibûn li wan ereban belav bikin di demekê de ku bi dehan hezar malên kurd xwedyên wan zeviyên hene ku ji bostek erd jî bê parin , û ev gava şovîn hatiye avêtin li ser bingeha nama ku ji wezarata çandinî û sazkirina çandiniyê derketiye di bin jimara (1682 / m d / 3-2-2007)ya (Qiyada Qitrî) ya partiya be 'es , û li gor vê biryarê di (13/6/2007)an de rêvebira çandinî û sazkirina çandiniyê li hesekê (5600) donim zevî ji gundên kurdan (xirab reşk , girê reş , qidêrik , girkê mîro , qizircibê)dane wan malên ereb .

her wiha jî desthilatên sûrî her serê demekê wan zeviyên cotkarên kurd yên hindik ji wan distînin ku bi keda xwe û xwêdana xwe ji keviran paqijkirine ku ne zêdetire ji çend doniman ne zêdeter bû û dane ereban bi behana ku erdê wan kême , weke ku di bîst salên derbas bûyî li dihan gundên kurdan de li herêma Dêrikê (Sermisax , tokil , kêşik , dêrûnê , cîlika , mistefawiyê ..) çêbûye ,bi omîda ku zor xurtir bibe li ser hemwelatîyên kurd û wan pirçî bikin da ku neçare ji dev gundên xwe berdî û vala bikin li gor daxwaza M.T.Hilal. Birastî ev zincîra pirojeyên şofînî ne ji valahiyê hatiye , ku dixwaze hebûna kurd tunebike , lê belê

ji wî mêjiyê şofînî qirêj hatiye der , ku xwedyê wê (Mîşêl Eflaq) bû ewê ku ramanên xwe ji (Hitler) wergirtibûn , ew mejiyê ku rêjîmên sûrî û îraq mixabin bawerî pê anîbûn , ji ber ku pirojeyên nijad perest li herêmên kurdî li sûryê û bi taybet li Cezîrê ku bûye û hîn jî di bin ji bo erebkirina wan herêman û valakirina wan ji xelkên wan û ji bo guhertineke dîmografî lê bi cî bînin , ev şêwe ji pirojan hatiye fotokopîkirin ji pirojeyên ku li gelek herêmên kurdistana îraqê hatine pêk anîn (Kerkûk , Xaneqîn , Mendelî , Şingal , Mexmûr , Zimar ..) , ev pîlan îro bûne astengî û kelemîn mezin li pêşiya avakirina sazûmana fîdralî li îraq , û herwiha jî bûye bûmbeyek (mayin) di her demê de pirojeya siyasî bi tevayî dide herifandin û xerakirin , û baca wê jî ne tenê mîletê kurd wê bide lê belê îraq bi tevayî, û herêma rojhilata navîn jî bi tevayî wê bacê bide , û îro vaye cîhan derbasî sedsala bîstan bûye ku gelek guhertin û bûyer û nerînên dîmoqrati û mafên mirov bi xwe re anîne ku bûye şoreşek mezin li dijî nerîn û baweriyên diktatorî û zordest ta ku gihişte bidarvekirina (Sedam Hisên) ewê ku ev mejiyê qirêj bikar aniye bi şêwekî kirêt û rûreş gihişte bikaranîna çekên kîmawî li dijî kurdan , lewma berdewamiya li ser vî mejiyê qirêj ne aqilmendiyeke ji ber ku dem jê derbas bûye û bûye ji pêmayên kevin , û demê da nîşan dan ku ev mejî pûçe û qet bi ser nakeve di qirkirin û qûtbirîna mîletekî kevin de , ev pirojeyên ku her û her bi

xerabî li xwedyên xwe vegeriyane , û ji ber ku ev piroje mîna bombeyan têne çandin di nav yekîtiya niştimanî de, û her wê ew bombe rojekê biteqe eger kesên aqilmend û heskerên yekîtiya welat û pêşeroja wî, zû van pirojeyan pirotisto nekin û doza sekinandin û rakirina wan bi yek carî ,û bê çawa zinarên xweteqîn dujminan tenê nakuje belam xwedyê xwe pêşî dikuje li gel kesên bê sûc û guneh jî (zarok , kal , jin ..) , wilo jî pirojeyên şofînî van kesan tevan dide ber xwe ji ber ku ji eynî mejî ev piroje têne der , gelo her yek ji cihê xwe (ji hundurê desthilatê û ji derve) wê van pirojeyên kirêt pirotêsto bike ??, da ku yekîtiya welat bi parêze ji agirê van zinarên xweteqîn .

Ez çûm welêt-1

Silêman Demir

Ez îsal çûm welêt. Ez ji bo serdana merevên xwe çûm, lê min awir li ser derdorê û rewşê hûr kirin û min nerî. xwestina min ew bû ku ez *potboriyekê* bûyerên balkêş bikim nivîsek, ya jî dido re û bidim xwendevanan.



Heyşt rojên min ên pêşî bi serdan û xwarinan, li Nisêbînê derbas bûn. ez negihîştim tişteki balkêş bibînim. lê min zû dît ku êdî jin jî li parka bajêr a serekî ku wek qahweyekê tê xebitandin rûdinin, çayê, kola û soda vedixwin û bi okey dilîzin. min pirsî bê ma kî ne, gotin bi piranî tirkên mamoste ne, lê gelek Nisêbînî jî tên rûdinên. her wilo min zû tê derxist ku li sûkê û bajêr dengên peyva bi kurdî pirtir in, ya jî bi min wilo hat.

Ez piştî wan heyşt rojan daketim Qamîşlo. min roja pêşî dostê xwe yê nivîskar Ebbas Îsmail dît. em peyivîn û min daxwaza dîtina nivîskar û rewşenbîrên bajêr kir. min navên çand kesên ku min nas dikirin got, wî jî got hêsan e. roja din em çûn serdana du-sê camêrên wilo û em hinekî peyivîn. Lê camêran pêşniyar kirin ku wê civîneke firehtir ji bo gelek balkêş be, min jî kêfxweşiya xwe ji bo pêşniyara wan eeşkere kir. me li ser roja sisêyan, li mala camêrekî ji wan li hev kir.

Ez mam li bendî wê rojê.

Li Qamîşlo, xelk bi rojê radizin û bi şevê jî şiyarin. min jî kirasek li xwe kir û bi rojan wek wan kir. êvaran piştî ku rok diçe ava, nû mêvandarî dest pê dike; piştî saet yazdeh û dozdehan jî îcarê heger mirov bixwaze, nû dora derketina derve tê. ez û du xortên malê me carekê taksiyek girt û me saet yazdehan da ser rê. gotin "em ê herin Qelaa". Restoranteke nû ya kurdan e, li kêleka rêya Heskê ye, li ser dor du-sê hezar metroyan hatiye avakirin. Bi rastî jî ji pêş ve wek keleheke demên kevna bi bircên spehî û bi wirşe xuya dikir. pêşiya wê vekirî û havînî ye. Bi dar, gul û av e. muzîka zindî bi kurdî û erebî lê heye. Malbat jî bi jin û zarok li nêzîkî dikê rûdiniştin. xwarin û vexwarina wir hêjayî pesindayîne ye. germa êvarê li nava bajêr dor 35-40 bû, lê mirov li wir sar bû.

Ez bi dû re pê hisiyam ku mihendisê ew spehîbûn ava kiriye, dostekî min ê kevn e. bi dû de, wî û çend dostên din jî ez carekê birim wir û ez serwextî gelek tiştan kirim. Spas.

Min berê bi çavên xwe dîtibû, bi guhên xwe bihîstibû û bi hişê xwe tê derxistibû û wê êvarê wan camêran ez fêr jî kirim ku li binxetê şerme kurd bi erebî bipeyivin. min pirsî bê ma ên ku xwendina bilind kirine, ango doktor, mihendis, avokat, mamoste û hwd. jî?. kenîyan û gotin kek Silêman ji xwe ji bo wan pir şermtire, kurdî heye, ma çima erebî. Ji min pirsîn, "ma li serxetê jî ne wilo ye", min serê xwe kir ber xwe û got mixabin na, ên me kurdên ku ji turkî, ji turkî hez dikin. bi

bihîstina vê yekê re dilşkestî bûn û ji bo ku serê min dîsa rakin, qedeh hildan û gotin "xeyo wê ên we jî rojekê şiyar bibin".

Tew, kero nemir heta qîvar şîn bibin! li tirkîyê ji niha ve nîgekî kurdî di gorê de ye û yek li dinyê ye. ez baş bawer im ku wê "ên me" qet şiyar nebin û naxwazin şiyar bibin. lê belkî berê rewşê bêguhertin û nîfşê bê şiyar bibe. Ên niha, ew kujerên kurdî ne.

gava roja civîna min hat, ez bi kelecana çûm. dor deh-doze nivîskaran bûn. camêrekî gotin girt, got hêja, me nikarîbû gelek bicivandina, tu zanî emîn û dewlet... û ez bi mêvanan dam naskirin û ew jî yeko yeko bi nav û deng û kar û hinerê wan dan naskirin û gotin da min. min jî bahsa karê xwe, awayê xwe yê nivîsandinê û prensîbên xwe kir. bi dû re me pirs ji hev kirin û şevbuhêr domand.

ez zû gihiştim baweriya ku ew camêrên li dora min bûn, hemû egîten parastina kurdî bûn û serbilindên ku bi kurdî hiner dikirin bûn. Ez bi wan re dilgeş û hêvîbilind bûm.

Ez li wir fêr bûm ku çend camêran ji wê grûpê, berî çar salan li Qamîşlo dest bi dersên kurdî kiribûn. Li malan, bi dizî, grûpên biçûk fêrî kurdî dikirin û ew karê wan hîna berdewam bû. Heta îro 5000 kes fêrî kurdî kiribûn.

Xwendekar heta sisê derecan fêr dikirin.

1- xwendina bi kurdî,

2-xwendin û nivîsandina i kurdî,

3-mamostetiya fêkirina kurdî.

heta wî çaxî gelek mamoste gihandibûn û ew mamoste bi dilêrî dixebitîn.

bi bihîstina van karên wan re, hêsir ketin çavên min. li gora ez bi dû re fêr bûm, hin ji wan wilqasî feqîr bûn ku êvaran nanê wan bixwara tune bû, lê ji ber wî karê xwe yê pîroz, serbilind, dilgeş û hêvîbilind bûn.

Kovareke wan a bi navê Ziman bi pêşengiya Derwêşê Xalib derdiket. Ji nivîsên fêkirina kurdî pê ve, nivîsên hin mamosteyan tê de hebû.

Karê wan wilo biserketî ye ku, êdî kovareke mezintir a bi navê ZAR jî derdixin. Dihat gotin ku li hemû deverên Sûriyê ku kurd lê hebûn, belav dibû.

Xelkê rûmeteke mezin dida wî karê wan û gava navê wan dihat gotin, digotin "ew camêr kurdên herî bi rûmet in, ew ronahiya çavên me ne".

Li min jî dikeve û ku ez bibêjim bijî egîten fêkirina zimanê kurdî.

Ez bi dû re fêr bûm ku partiya yekîti jî karekî wilo fikir, wan jî heta wî çaxî 1500 kes fêrî kurdî kiribûn. her wilo zarokên kurdan ên biçûk dicivandin û ew bes tenê fêrî reqsên kurdî û lîstikan dikirin û bi kurdî bi wan re dipeyivîn.

2008-08-12

Di rizgari.com de belav bûye

Bajarê Cizîra Botan Bûka Mezopotamya ye

Konê Reş

Cizîra Botan, bajarekî gelekî kevnar e, mirovahiyê mora xwe li gelek perestgeh, mizgeft, keleh, qesir, pir, sûr, burc, û gelek avaniyên wê yên cur bi cur xistiye. Gelek şaristanî têre derbas bûne û her şaristaniyekê bermayê xwe, şop û şûna xwe li bajarê Cizîrê hiştine. Bajarê Cizîra Botan ji kurdan re bajarekî pîroz e, ew jî mîna bajarê Qudsê (Orşelîm) e. Ji ber ku hêjî ew bajarê Kurdî yê orjînale; Kurdîtiya xwe parastiye, zimanê kurdî di kolan û çarşiyên wê de tê axaftin û yê bazarê ye.



Ji xwe wek ku tê zanîn, piştî tofana Nûh Pêxember mirov li herêma Botan; bajarê Şernex û Cizîrê bi cih bûne. Di pişt re di cîhanê de belav bûne. Dibêjin dema keştiya Nûh pêxember li ser çiyayê Cûdî sekiniye, nav li çiyayê Cûdî hatiye kirin û gotine (Cî dî), ango keştiyê wî cihek ji xwe re dît. Di Qurana pîroz de jî hatiye: (*We estewet ele el Cûdî*), ango keştiya Nûh pêxember li ser çiyayê Cûdî sekinî ye.. Jixwe kurd dibêjin; di heyamê tofana Nûh de, dema keştiya wî di ser çiyayê Şingalê re derabs bûye, li kûpê çiya ketiye û

konek tède vebûye. Mar xwe kiriye gulofîtek û ew kon girtiye, da ku av nekeve keştiya wê de.. Û dibêjin ku kevokê bi nikilkê xwe şaxek ji dara zeytûnê, wek mizgînê ku nêzîkê bejayê dibin, ji çiyayê Cûdî ji Nûh pêxember re aniye û ji wê hingê ve kevok û şaxikê zeytûnê bûne sembola aşîtiyê. Hem jî dibêjin ku navê Nûh pêxember ji gotina (Nû) a kurdî hatiye, bi wateye nûbûnê. Ji ber ku dinya wê hingê ji nû ve hatiye ava kirin. Dema ku Nûh û her heştê hevalên xwe, li ser çiyayê Cûdî ji keştiya xwe daketine, wana di quntara çiyayê Cûdî de gundek bi navê Heştêyan ava kirine. Ew gund ta roja îro jî di pala çiyayê Cûdî de ye. Xuyaye ku di pey gundê Heştêyan re, bajarê Şernexê hatiye ava kirin û jêre gotine Şarê Nûh ango bajarê Nûh an şarê Nû... Bi dirêjiya demê û pîrbûna mirovan re xelk ji herêma Botan derketine û li dinyayê belav bûne û weha kurdmanc li cihê xwe, herêma Botan mane û ji wan re hatiye gotin **Kurdmanc**, ango(Kurd Man li Cî).

Di baweriya min de bajarê Cizîra Botan ji kurdan re mina bajarê Mekke ye ji Ereban re. Zimanê wê jî ji kurdan re mîna zimanê Qureyşîyan e ji ereban re.. Ji kevin de û ta roja îro zimanê kurdî tekane zimanê axaftina xelkên wê ye. Zimanê danûstandin û bazirganiya wê ye. Di roja îro de bajarê herî dawîn e di nav kurmancaxêvan de, ku bi tenê zimanê wê kurdî ye û zimanê kurdî parastiye û diparêze. Piştî ku serhildana mîr Bedirxan di sala

1847 an de beravêtî bûye, mîr û malbata xwe di sirgunê de dûtî welatê Botan jiyana xwe derbas kirine û bi taybetî piştî damezirandina komara tirkîyê di sala 1923 an de, şerê ziman, dîrok û hebûna kurdan bi tundî hatiye kirin. Ango ji 161 salî ve xelkên Cizîrê li ber xwe didin.

Ji 95 salî ve, dagirkeran bi sedema ku zimanê kurdî ne mine, bi rêk û pêk şerê zimanê kurdî kirine. Zimanê kurdî wek sembola paşverûtîyê û nezaniyê destnîşan dikin. Û dagirkeran, ne tenê planên bişaftina çand û ziman li ser kurdan meşandine, lê belê wan xwestiye ku kurdan di her warî de asîmîle bikin... Lê Botanî, di roja îro de şerm dikin ku bi hev re bi tirkî biaxifin.. Xuyaya ku Mîrên Botan jî, digel serhildan, nakokiyên xwebixweyî û têkçûnan, hişmendiyeke kurdewarî di herêma Botan de çandine. Her weha di bin desthilatiya wan de çandek kurdewarî hatiye afirandin û zimanê kurdî wek zimanekî şaristaniya pêşketî di nav çerx û dewranên salan de hatiye bikaranîn.. Wêjeyek bi zimanê kudî hatiye nivîsandin û weha gelek zanyar û rewşenbîr ji nav civaka Botan derketine. Nav û dengê gelek ji wan di cihanê de belav bûye. Armanca dagirkeran ne tenê pişaftina çand û zimanê kurdî bû, belê wan xwestiye ku hişmendiya dîrokî jî, ya gelê Botan ji holê rakin... Li gor ku min dît û nas kir, dîroka mîrnîşîna Mîrekên Botan a ku di herêmeke berfireh de, bi navê Mezopotamiya ku dor hezar salî dûm

kiriye, qet destûr nedaye û nade dagirkeran ku planên xwe bi rehetî derbas bikin, her dem û gav Botanî bûne kelem û asteng li pêşiya projeyên wan... Ji ber ku xelkên Botan, di dîrokek dirêj de, ji hêla *mîrekên Azîzan* ve, bi hezkirina ziman û welatê xwe hatine perwerde kirin. Lê sed heyf û mixabinî ku nezaniya me jî bûye alîkarî ji dagirkeran re, ku pêmayên me yên dîrokî li ser piyan nemînin...! Burca Belek û gelek şûnewarên dîrokî yên din wêran bûne. Ji bilî wan, gelek cihên dîrokî hene, ku şop û şûna wan nema xuya dikin. Dagirkeran jî gelek cihên dîrokî wêran kirine, hin jî di bin ava Dicle de mane.. Gelek cih jî di bin erdê de nebedî ne, xebat û xepartin ji wan pêwîste..

Û tevî ku roja îro 25/09/2008, 84 mizgeft li bajarê Cizîra Botan hene û dewlet tirkî mehiya 84 Melayan dide, lê min ew bandora olperestiya îslamê a zêde lê nedît..

Erê! Cizîra Mîr Şeref; Roka jiyanê ye.. Landika şaristaniya mirovahiyê ye.. Navendek ji navendên olên cîhanê ye.. Deftera afirandina ramyariyê ye.. Kaniya reseniya kurdewariyê ye.. Keleha berxwedana azadî û zimanê kurdî ye.. Heca kurda ye û bûka Mezopotamya ye.

ZAR Û ZIMAN

(1)

Arşek baravî

Zar ji karmendiyên mirovîni tundiye, ango di jiyana lawirî de peyda nabe tevku despêkin di asta meymûnanî bilind de jî neyin û nepen nabin .. belê ew despêkin jandarin, dêmekî ji bingeheke civakî .. rê li ber girtiye.. an hatiye girtin.



Ji gencîneyên lêkolînên bilîmetên cîhanî û kevnar tê nasîn ku zar yek ji mercên mirovahiya mirovaye.. mercekî resene û hîmdeye.

Zar bi derbasiya pêngavên delîve û qonaxên zarotiyê hatiye vegirtin û ji têkiliya ziman û ramanê bi hiş re sûd û hode wergirtiye.

Tenê mirov dikare zar bikar bîne (şêkarê axaftinêye) .. binivîse .. paxive .., lewra di pir beşên zanyarî de lêkolîn û kwîrkol jê re bi nav bûne .

Pîtolên derûnî jî pirr berhemên balkêş di biwarê zar û derûnê de şirove kirine ... û ravekirin dane, hevkarîya hiş û ziman berdewame .. çiku dever û navendên peyivandin û axaftinê di mejî de cîgirin... aşkart û aşkere bûne, di evî warî de û li ser ronahiya çirûskên berêzêd berya me ... tevlî kêmasî û şaşîyan... emê berbi pêşxistin û duristkirin û ...geşînkirinê de bimilin, hêviya me ewe ku em

berekî nûvar û xweş ji mêweyên bi mize û çêj û bi mizyarî perû û pêşkêş bikin.

Bila tu kes xwe meke xwediyê tiştekî an şîretvanê radeyekê ..û di pê re helwesta wî di rolê de lawaz bibe, ku bayikê wî tune be ..!.. lê ku pingirandin û kîndarî be ..ewê di ewê dexsê de bikizkize .

Di cîhan de çiqas millet hene evqas ziman jî hene, tevde ji hev cudane, pîrbûna şêwezarên zimanan jî bi kevnariya dîrokî û pîrbûna hejmara amarê û pêşketina têkiliya deshilatdariyêye ..

û bi berdewamkirina serdestiyê ve berpîvaneke pêwîste..

Lewra zimanê kurdî jî pîrşêwezare, lê ku em her nerînekê li gora şêwezarê deverê binerxînin û em tevayên şêwezaran bi ewê nerînê ve bipîvin..em gunehkar dibin,çiku em tevayên şêwezarên dîtir neşê û neçar dikin, emê wan bimestînin û bêcan bikin,.. û ev ji zana re nabe pîver û terazû.

Ziman pîtoliye (felsefeye) ..bi live û bi cane.

Balo ku em bêjin berêz Celadet û hemû rêzdarên dîtir, her yek ji wan peyamberê dawî bû , çima bûn (Celadet- Tewfîq- Ereb- Qenat- Kamîran- Reşîd- Osman..h...w..)

û her yekî ji wan berêzan.. di bin bandora şêwzarên navçe û devera xwe de û bi nerînên cuda û cîwaz jî, rêzimanî şopandine, de ka em bêjin A B C ya kurdî (durvê tîpa)qalibeke ji xwe ve hatiye , ne ji zimanên hindoropî hatiye veguhêztin , dêmekî em xwe şaş nakin ..em xwe zana dibînin .. em hempazin û her yek ji me tu kesî ji xwe pêve nabîne , ku em ev bin

..silavên xwe ji zimên rre bihinêrin (Yezdan zimanê me bi dilovaniya xwe şa bike).

Pîvera ewê pirsra ku ji her zîrekekî dibe : ka tu ji kîjan Akadîmiyê derhatiye ?..., û bersiv jî :

Ma gelo ew hemû zanyarên kevnarî ji ewan rojgarên bûrî ... ji bilî ku ji Akadîmiya gellê xwe derhatibûn û pêve tu Akadîmî ji wan re hebûn? .. belê hinan ji zanyarên cîhanî ji zanestiyê Akadîmî ji gellê xwe re damezrandin û berdewam bûn.

Birano kî ji we dikare çi ji zimanê xwe re pêşkêş bike bila bê tirs û fedî û rawestan be , çiku lêkolînên pêşinyarî (pêşniyazî) çendî pir bin hempayî sûd û wircên rojane .. ayindê lal bi zar û bizav dikin.

De îcar ew kesên ku bingeha xwe lawaz dibînin , dava rexnê di her tiştî werdikin, neşêne ..jar û mestin , lewra zana û zîrekan ji xwe re dikin nîşan û armanc, da bi wan rre navdar bibin, çiyê neçiyê.. vaye em jî her tiştî dizanin, tevî ku me hin hewldan kirin û ji ber berjewendiyên kesane têkve çûn(bi ser neketin) lê em ranawestin.. em di rîpên bazirganiyê de serkeftîne..em dirav bi kijên bilind di hemû delîveyan de zanin bicivînin.. çima kirî em ne hertişt bin ? erê em hovîn lê rola zanîne ji me re heye ..em têkoşerê nepenin..

Em bi gova û bawernamene..em bi perene ..balo tukes ji me zanatir nine, dema em xwe di zanyaran û mijarên demane derxin ..çê be xerab be ne derde , çewt be rast be ne derde , tenê emê kar bi derengî xin û kînen bê bingeh pêk bînin.

Ku ez kara û têgihiştî bim ezê bidim ,çima ezê xwe bikim şîretvan û pêrre jî bixwazim, na tew ez rexnê jî dikim êrîş û bi şêweyekî wenda jî ..kî tê digihêje ?..hovin?..şêtin ..? an ez bêmejîme? ...mexabin..

Zimanê kurdî yek ji zimanên Ariye ... kevnare , ji şaxê rojava (zendî) ê ku ji komela (malbata) zimanên Îraniye , ev malbata ku goveke mezin ji zarên Arî jêne..û têrre zarê Avistayî ku Zeradeşt - ew pêxemberê milletên Îranî --herdû berên pertûka xwe ya evra Avista: (Zendavista) û (Vêninda) pê nivîsand , ew zarê herî nêztirîn ji zarên Îranî ku ber bi kurdî de bû , dibe ku yek ji şêwezaran be jî , her wekî ku zarê Pehle (parisiya navîn) û parisiya nû û kurdî û Estînî li navîna Qewqasa bakur jî jêne (ji malbata Îranîne) , zarê kurdî li ser hêza xwe ma û zaravên xwe êd resenî ku regezê wan ji Avistaye - zarê Mîdiya - ku hin bavpîrên kurda ên di bakurê rojavayî Îranê de berya ku Guhreş dewleta Pars ava bike deshilatdar bûn ...ew parastin .

Zarê kurdî li çar şêwezarên ku her yek jî weke zimanekî xwe dinasîne ... pay vedibe , li sê hevciyan ji Kurdistanê belav dibe û dipexşire : şêwezarê bakur û şêwezarê başûr (kumanciya jorîn û jêrîn-xwarê) û şêwezarê bakurê rojava (Zazakî) û şêwezarê Lorî (Bexteyarî) .

1- Kurmanciya jorî (Behdînanî): hemû kurdên bakur di herêmên rohilat û başûrê rohilatî Turkî de û kurdên li Qoqasa başûr di Ermenistanê û Gurcîstanê û Azerbêcanê de , û kurdên li başûrê biçûk (Sûrî) û li Şingal û Zaxo û Eqrê û Zîbar û

Îmadî û Şêxan li şarê Dihokê , her weha jî kurdên leqa Qoçan û Beçnort li şarê Xurasanê ... pê taxivin .

2 - Kurmanciya xwarê : li kurdistana başûr (Îraq) , başûrî xîça Rawendoz - Mûsil - û kurdên Rohilat (Îran) di herêmên başûr û başûrê rohilatî gola Ormiya (Rizayê) de ta bighêje başûrî Loristan û Bextiyarê ... pê taxivin .

Lê şêwezarê kurmanciya jêrî (xwar) bi sê komgêrên mezin payvedibe...

A - Babanî û Soranî : li Silêmanî û Kerkûk û Hewlêr ji başûrê Kurdistan (Îraq)

B - Mukrî û Erdelanî û Kelherî li rohilat (Îranê) belavin ...

Mukrî bi xwe li herêmên ku bajarên (Şeno - Lacan -Sablax -Serdeşt..) ta bighêje sînorê Miyandiwavê ... û Erdelanî li şarên (Bêcar - Kiros-Ciwanro-Bane ..) û rexa rohilatî rûbarê Sîrwan belav bûne .

C - Hewremanî û Goranî : Hewremanî li herêmên Hewremana çiyê li navbera Mirêwan û Sîrwan.. nêzî sînorê Îraqê bi kar tê .

Lê Goranî.. ew kesên goranên bawermendên rastiyêne xwe dibînin xwedanên maf .. û zavên wan ji zavên hinavî bisilmaniyêne ,.. herêmên Goran li nêzî rêya Xaniqîn û Kermenşahêne .., û ev herdû şêwezar nêzîkayê li Zazakî di bakurê rowavayê Kurdistanana bakur (Turkî) de dikin .

3 - Şêwezarê bakurê rowava (Zazakî) : êlên Dumilî (Zaza) li herêmên Dêrsim - Palo - Gênco - Çebeqçûr - Madin - Pîran -Agîl - Sêwêrek-Bêcar-

Çermûk..pê taxivin û di herêmên ku êlên kurmanç bi êlên Zazan re hevjin de..bi kurmançî û bi zazakî jî taxivin .

4 - Lorî û Bexteyarî û Lekî : li Loristana mezin û biçûk bikar hatine .

Her weha di van şewezarên binavkirî de , her yek ji wan ji dehan bêtir şewezarên deverkî hembêzdikin ..ji bilî şewezarê Zazakî ew şewezarekî xurû û serbixweye .., ev hejmara şewezaran di zimanê Kurdî de dinase ku ev zimanekî kevn û resen û dewlemende , lewra xwe ta roja îro parastîye...

Ev zimanê hevdûdanî û xweza ji zimanên regezê Arî ta nuha xwe li ser niga hiştîye , tevî bandora bîndestîya kevnar .. û xwe li ber hêzên Olî û Ayinî aşkartiye mançî kiriye , lê mixabin bandora zarave û ciyokên dagêran pîr lê kiriye (lê bûye) , lê hin makiya gote û bêjeyan ji Parisî bêhtir parastîye , ew jî mîna hin zimanên Latînî.. nêr û mê li nav xwe wergirtiye : tîpa (Ê) ji mê re di darêja palvedarî de û (O) ji bangîna nêr re holisandiye , pêrnawên xwe bi du cureyan li nav her çî şewezaran de man hiştîye , tew ew hûrbînên zimanî (pêşgir û paşgir) ku bûne bingeheke rojgarînî boy peydakirina hevwaterên demane .. û hîn û hîn bêhtir dewlemediya rêzanên rêzimana evî zarê pîroz û berfirehiya ferhenga wî ..tevî peydabûna arîşe û aloziyan jî ...

ZANA XANÊ

Bê gûman zanebûna bi du zimanan, yan bêtirî wilo, û bi karanîna wanî her roj ,pir fêdê dide mejyê mirovan.

Li gora vekolînên zanyarên zanîngeha York ya li Keneda yê, dibêjin:

Heger mirov bi du zimanan yan bêtirî wilo bipeyive , û bi karbîne , nexweşya lertzê (ilizhaymer) zû bi zû lê na xîne.

Di salên navêna 2002-2005 an de, zanyar (**Ilîn Biyêlistok**) vekolîna xwe li ser 184 mirovên xityar pêkanî , ji wan 91 kes tenê bi zimanê diya xwe dizanî bûn , û 93 kes ji wan bi du zimanan xweşik dipeyivîn.

Piştî vê vekolînê zanyar **Ilîn** nas kir, ku ji koma ên ku bi zimanekî tenê dizanî bûn emrê ketna wan bi nexweşiya Ilizhaymer 71,4 sal bû, û ên bi du zimanan zanî bûn emrê ketna wan bi vê nexweşyê 75,5 sal bû.

Ji bo vê meselê lêkolînavan dibêjin,divê em li ser tiştin din bisekinin,wek asta xwendina mirovan,mirov jine yan mêre,....,ku ew jî helbet bandora wan li vê çîrokê heye.

Lê tişta pîr bi fêde ku zanyar gihştinênê,eve:

bikaranîna du zimanan mejyê mirovan, her gav dişixulîne û wî di kar de dihêle,lewra hin nexweşiyên mejî bi derengî dikevin.

Azad Piling



di van çend salên dawî de nivîskarên kurdî pir têne derxistin û weşandin wek destpêkê pir başe di aliyê pêşxistina ziman bi hemû cûreyên toreyî de çî (helbest – çîrok – gotar – rêziman – h d) û nemaze di vî çaxî de ku nivîsandin bi zimanê kurdî ya herî gunehek mezin û qedexe ye ji aliyê desthilata welatê me ve, lê ya herî giring û li cihê bextewariyê ye ew nivîskarên me viyana wan tund û hişktir dibe, û tim û tim dixwaze bi xurtî vî zimanî dehif bide ber bi pêş û sax bimîne û cihê wî di nav zimanên cîhanê de bigre, û ya herî baş tir hejmara xwendevanên me zêdetir dibin li ser ku wan astengên di pêşiyê de derdikevin çî ji hêla çapê û belav kirinê de jî . û ew astenge dibe sedemek serekî dihêle ew weşan bimîne dîlê çarçovek teng de, û rengêk deverî bide

wan belavoka û rê li ber nivîskaran tê girtin. vêca nivîskar berê xwe dide internêtê da ku bi serbest û azad berhemên xwe bi weşînin, û ne xeme eger xwendevan hebin yan jî nebin û heger hebin jî pir kêmin, ji ber ku rewşa aboriya xirab ku welatê me têde derbas dibe herkes nikare kompiyotrê bikire û komek pere li ser internêtê xerc bike, ji ber ku wê li ser hesabê tiştên girîngtir bin û bes çara di destê wî de dimîne pênosek û pelek sipî di derengê şevê de û li nav livîna xwe ta stukurê kul û keserên xwe bi herikîne, û di sehara serê sibehê de tavêje paşora livîna li ber devê qulên mişka .

Hekîmê Luqman kî ye?

Mizgîn Hemo

dibêjin ku Luqman kurê Yaşûre, kurê xuh an jî kurê xaltîka Eyûbê navdare, ji reşên Hebeşê bû ,û hin dibêjin ji reşên Misrê bû ,û dadvan bû di nav Cihûan de ,ew yê pêşî bû ku navê hekîmiyê wergirt , hin dibêjin ew bi karê xwe terzî bû ,û hin dibêjin şivan bû ,û hin dibêjin darvanî bû ,dibêjin jina Luqman û kurê wî gawir bûn û Luqman şîret li wan kirin ta ayîn ket dilê wan,dibêjin dema Cibrîl nameya xuda jê re anî , xudayê mehreban di vê nameyê de du rê dan pêşiya wî ,riya pêximberyê û riya hikmetê ,dibêjin ewî riya hikmetê hilbijart ,ji ber ku ewî barê pêximberyê giran didît li ser milê xwe ,û dibêjin ew sax ma ta dema nebî Dawûd û ewî zanistî ji nebî Dawûd girt û nebî Dawûd jê hikmet girt .

hekîmê luqman di hemû babetên jiyanê de şîret dikirin ,û bi taybetî di warê perwerdeyê de

hin ji şîretên Hekîmê Luqman:

jina qenc û jina pîs:

kurê min :jina qenc wek tewaşê ji serî re ,damaran nerm dike û mûyan xurt dike,ew wek taca serê padîşahe,ew wek dur û gewheraye her kes nixê wê nizane. û jina pîs wek şapê ye dawîya wê nayê ta

neghêje dawya xwe ,ku di axive dengê xwe bilind dike ,ku bi rêve diçe dilezîne, ku rûdinê xwe bilind dike , ku bihna wê teng dibe bi deng dibe , û dermanê her tiştî heye ji bilî dermanê jina pîs.

zanîn û kar:

xêra zanînê tune ye ku mirov wê zanînê bi kar neyne ,wek mirovekî ku êzing dane hev û nikare rahêje wan , hewl dide ku rahêje wan nikare,radihêje hin êzingên dî li wan kom dike.

giranya şîretê:

şîret bi ehmeqan girane wek giranbûna hilkişîna kalemêr li ser kaş û kendalan .

ziman û dil:

kurê min ku xelkê pesnê xwe bi qenciya axaftinê xwe dan , tu pesnê xwe bi qenciya bê dengiya xwe bide ,her sibe û her êvar ziman ji dil dipirse , ma tu çawa ye ,dil dibêje : ez başim ku tu ji min dûr be .

dadkirin:

ku mirovek hat cem te û herdû çavên wî derketî bin ,tu mafî nedyê ta ku dijberê wî bê, dibe ku wî çar çav derxistibin.

bi sultan re:

kurê min: ku tu li civata sultanekî rûnişt , bela şûna rûniştina mêrekî di navbera te û wî de hebe ,dibe ku yek ji te nêzîktirî wî bê ,ewê te ji cê te rake,wê ew tişt kêmanî be ji te re.

Sînem Bedirxan: “Dema ez bimirim, min li Cizîrê veşêrin”

Ev hevpeyvîn ji bo yekemîn salvegera nivîskar **Salah Sadalah**.



Dema mirov navê Bedirxaniyan dibihîse yekser du tişt tên bîra mirov. Yek jê, di

sedsala nozdehan de dema Mîrîtiya Bedirxaniyan li Mezra Botan û ya duwem, di sedsala bîstan de xizmeta Bedirxaniyan ji bo rewşenbîriya Kurdî.

Keça Celadet Alî Bedirxan Sînem Bedirxan bi salan li Bexdayê di bingeha Neteweyên Yekbûyî de Internationall Schoolê mamostetiya zimanê Fransizî kiriye, niha xanenîşin (teqawit) e. dibe.

Sînem Bedirxan herweha zimanê Kurdî, Erebî, Îngîlîzî, Fransizî, Almanî û piçek jî Tirkî dizane.

Çîroka Mem û Zîn ku ji aliyê hevjinê we Salah Sadalah ve bi zimanê îngîlîzî hatiye wergerandin.

- *dikarî behsa pêvajoya amadekirina vê pirtûkê û xebata berê ya Kak Salah Sadallah bikî?*

Sînem Bedirxan: Bi rastî baş nayê bîra min, salên 80'ê hevaleyê hatibû li Londra û bi kak Salah re ser edebîyat û kulturê axivîn, jê re got di edebîyata kurdî tiştêk nîne, mesela wekî Romeo Julîet, wekî

Leyla û Mecnûn... Kak Salah jî jê re got tişteki gelek mezin li cem me heye. Eva nêzikî 300 sal e hatiye nivîsandin, navê wî Mem û Zîn e. Ew jî jê re got çima wernagerî zimanê Îngîlîzî. Demek paşe Kak Salah destpêkir û gelek kêfa wî jê re hat. Nêzikî 13 sal ser wergerandina Mem û Zîn xebitî. Hevalekê me yê ressamê navdar Mihemed Arif Siyamensûrî heye, niha jî li vir e, ew mamosteyê Zanko ye. Ew ji Kak Salah re sikêçên Mem û Zîn diyarî kir, ku di sala 70'ê de çêkiribû. Digot; "madem tu pîrtûkekî weha çêdikî, ezê van sikêçan diyariyê te bikim" û Kak Salah hêdî hêdî destpêkir. Dema ez di Internationall Schoolê ya Bexdayê de bûm, li wê derê ecnebî hebûn, me didan wan ku bixwînin, têdigêhin yan na? Mesela em çîroka Mem û Zîn dizanin, tu nikarî wekî hêsanî wergerînî, têde evînî heye, sofîtî heye, felsefe heye, wextê tu werdigerînî lazim e ku di Kurdî de çawa têgihîtin, pêwîst e ku zimanê ku werdigerînî, bi wê têgihîştîyê bê wergerandin. Ji ber hindê gelek hevalên me yên ecnebî xwendin, ewan tişteki zêde kirin, cihê ku tenegehiştine, derket holê. Pirtûk sala par, yanî di 2007'an da hazir bû. Me pirtûkê şande hevalekî, ku mamosteyî îngîlîzî ye li zankoyê. Ew dîsa xwend.

Mixabin, emrê xweyiyê pirtûk têr nekir ku çap bike. Me bi alîkariya Kak Neçîrvan pirtûkê birin li Îstanbolê, li weşanxaneyê Avestayê çap kir. Kak

Salah gelek vê pirtûkê hezdikir lê mixabin ewî nedît.

- Gelo bi baweriya te, nirxên pêwist ji bona berhemên edebi yên mala Bedirxan didin an na? Rola Bedirxaniyan li ser siyaset û çanda Kurdi çi ye?

Na, nikarim bêjim giringiyeka pêwist tên dayin. Bo nimûne diya min Ferhenga bavê min ji bona çap kirine şand akademîya Bexdayê. Piştî, çend mehan ez û kak Salah çûn akademiye. Me dît ku Ferhenga bavê min li erdê ye û me bi dizî Ferhengê girt û bir malê. Mixabin, 6 tîp jê kêmbû. Kak Salah ew 6 tîp çêkirin. Di pêşgotinê de nivisandiyê ku ev 6 tîp ne bi rêza Celadet Bedirxan e. Paşê Ebdilrah Keskin jî, ferhengok, ku di nav Hawarê de hebû, ew ferhengok jî kirin dumahîkê. Niha ji ber çapê ye. Ez bawer dikim di demek nêzîk de wê bê çap kirin. Tiştêkî nû ez bêjim, çend roj berê min bihîst. Ew 6 tîp ku wînda bûye, li ba yekê ye, ku li Swêdê dijî. Lê ez nikarim niha navê wî bêjim. Heta ez nebînim, çima navê xelqê bidim.

- Yanê ji min re wisa gotin, rast e ne rast e nizamim. Ew camêr, li Enstîtuya Bexdayê xebitiye?

Na, bes çawa gihîştîye destê wî, nizamim. Ji bona wê lazim e, mirov lêkolînek bike, ji hevalên Swêdê bipirse çawa gihîştîye wêrê. Ez ji te re bêjim, li cem min arşîv heye. Bes êdî ez newêrim ku bidime tu

kesî. Ez dibihisim filan kes nizanim çi çapkiriye, ez nizanim çawa gihiştiye destê wan kesan, lê disa çapkirina wan baş e. Xem nake, gelek xweş e ku carek dinê tê çap kirinê. Lê bila bêjin ku “”ev berhemê Rewşenxanê daye me, me jî çap kir”. Em haqê telifê nexwazin, yanê ji wan pere nexwazin.. Mixabin, Kurdê me bala xwe nadine vê tiştê.

Demek berê jî, digotin, Ferhenga Celadet Elî Bedirxan firotine biyaniyan.

Min bersîva wan da. Bes min got tiştêk weha nîne, niha ferheng li cem min e û çîroka ferhengê jî min got. Ew ferheng, niha nêzîkî 70 saliyê yê û ez bawer dikim ku ev yekemîn ferhenga Kurdî-Kurdî hatiye çêkirin.

Tu rola Bedirxaniyan dipirsî. Bi rastî piştî ku serhildana Bedirxan şikest, Bedirxaniyan dîtin bi şer nabe û zehmet e, xwe dan aliyê rewşenbîrîyê, xwendinê. Di sala 1898’an de Rojname Kurdistan derket. Wextê dibîne, dilê mirov dişewite. Bedirxaniyan, li Kurdistanê çî tune bû, çûn Qahire û li wir rojname derxistin. Wê rojê yekê got, (navê wî nayê bira min), “ew rojname Kurdistan ku 110 sal berê derketibû, wextê ez dixwînim, herçî ku niha derketiye, ku ew rojname ewqas pêşketî bû û tijî ye, tiştên hişyar bûnî, tiştên evînî.”

Bi rasti, niha Kurd bêtir xwendî ne, xwendevan hene, bes dîsa jî kêmasî heye. Wextê ez çûm Cizîrê, baştir e bêjim ez vegeyriyam welatê xwe, tiştê ku min li wêrê dît, ziman winda dibe. Cizîrê dîsa baş e,

ya Diyarbekirê tevî Tirkî diaxivin, mixabin. Ez çûm restorantekî (xwaringeh), rûniştim û min li derdorê xwe nêhêrî ku herkes bi Tirkî qise dike. Ez çûm li cem xwediyê restorantê û min jê re got; “ ez bi navê Neteweyên Yekbûyî lêkolîn li ser ziman çêdikim. Ji kerema xwe ji min re kaxiz û qelem bide.” Ez çûm masa yekê, min got; “selamünaleykûm, ez lêkolîn ser ziman çêdikim, gelo hun Kurd in?” Gotin “erê.” Min got, “hun çima Tirkî diaxivin?” gotin; “tu zanî, eva zimanê bazirganî ye?” min got; “tu û hevalê xwe ser bazirganiyê qisedikin?” gotin; “na”, gelo çima Tirkî diaxivin? Masayê dudo jî Kurd in, Kurdî nizanin, yê sisê dîsa Kurd in lê Tirkî diaxivin. Ya rastî depresyon ez girtim. Min hişt û ez vegeyriyam.

- Çima?

Em li parqê rûniştibûn, navê wê parqê nayê bîra min. Dê û bav di nava xwû da Kurdî xeber didan, ji keça xwe ra, ku emrê wê du sal bû, digotin “gel, git, otur,” Çima? Mesela wextê tu vegeerî ew kîtêba bavê min ya bi navê “De La Question Kurde (Pirsa Kurd)” di sala 1934’an da hatiye nivîsin, behsa asîmîlasyonê dike. Eva niha derdikeve. Ê lazim e em bi xwe çareyek bibînin. Nebêjin “wele zimanê Tirkî xweş e, zimanê bûrjûwazî ye, nizanîm çî û çî, ji ber vê yekê em Tirkî diaxivin.” Erê ev Rast e niha?

Niha mesela li Başûr, tu nabînî ku du Kurd bi hev re Erebi xeber didin. Yanê ew soranî be, an

kurmancî be, tevlihev dikin, axaftina bi Erebi çî ye nizanin. Lazim e em zimanê xwe bi axivîn, zimanê xwe biparêzin. Mixabin, dibistanê me nîne ku em zimanê xwe bixwînin. Yanê, em dibêjin zimanê dayîkî, lazim e axaftina Kurdi bi dayik, ve li malê destpê bike.

- Li gor we, sedema viya çî ye? Yanê em bêjin gelê Kurd hê jî ditirse?

Tirs nemaye. Kesek, ku emrê wan 50-55 salî bû, ji min got, ku “wextê em diçûn dibistanê, eger me bi Kurdî axiviya mamoste li me dixist.” Min jî jê re got; “ez dixwazim werim Diyarbekirê, eger yekî bi Tirkî axift, wele ezê li wî xim.” Bes niha li Tirkiyê, rojname derdikeve, kîtep tê çapkirinê.

- Ew pirtûkên Celadet Elî Bedirxan ku nehatine çapkirin, ji bo çapkirina wan çî difikiri?

Ferhenga Mamê min ku Kurdî-Fransizî ye, min dabû Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, lê heta niha çap nekirin, min jî wan xwest ku emê wê çap bikin. Gramera bavê min heye, vê careke din bê çap kirin, De La Question Kurde (Pirsa Kurd), heye, çîrokên zarokan heye, navê wî “Jonny Jimema”, ev pirtûk bi xwe bi Îngîlîzî ye, bi zimanê Fransizî hat wergerandin, bavê min jî wergerand zimanê Kurdî. Zimanek û Zilamek jî heye, Edirne Sikutu jî heye, emê vê jî wergerînin Kurdî, “Osmanli Tayaraci”

viya ya Mamê min û bavê min bi hev re çêkirine. Emê Album jî çap bikin.

Du kîtêbên mamê min hene, şîerên Fransîzî çêkiriye, emê vegeerînin Kurdî, bi navê La Lyre Kurde û Le Cafvaire du Kurdistan. Kîtêba rehmetî Salah Sadalah heye, ku ji îngilîzî wergerandibû Kurdî, bi navê Dîplomat, lê bi tîpên erebî, emê bi latînî jî çap bikin. Paşê kîtêbê Kak Salah yê ewil, berê 50 sal nivîsibû bi navê Kurdistan Divided Nation of the Middle East (bi navê S.S. Gavan nivîsi bû), vê pirtûkê wergerand Erebi û paşê jî Rûsî. Mamê min jî pêşgotina vê pirtûkê nivîsandiyê. Eva ne bes e! Ev barekî ne sivik e. Çi destê min bê, ezê çêbikim. Ya rastî piştî ku Salah emrê xwedê kir, tiştê ku min zanî, rojek tê jiyan xilas dibe. Ji bona wê min bala xwe daye van tiştan. Ez hez nakim bêjim ku eger ez çûm, êdî kes namîne ku guhê xwe bide van tiştan.

- Demek berê çûyî Cizîra Botan. Gelo dikarî dîtînin xwe bînin ziman?

Ya rastî ev cara ewil nebû, ku çûm Cizîrê, Cara yekê çûyînek taybetî bû, di sala 1970'an da bû. Em li Cizîrê nesekinîn, em diçûn Îstanbulê. Bes vê carê taybet bû, ez ji Parîsê hatibûm, telefona min kirin û gotin "Mihricanek wêrê heye". Navê mihrican "Rûmeta Ziman, Zimanê Rûmetê" bû. Ya rastî gelek kêfa min hat û ez çûm Cizîrê, wekî mirov vedigere welatê xwe. Yanê, heta, ku em mezin bûn, em neçûbûn Cizîrê. Em piçûk bûn, bavê min behsa

Cizîrê dîkir. Digot; “Cizîr xweş e, wextê hûn mezin bin, emê vegerin Cizîrê, Birca Belek û Mem û Zîn û Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî”. Ew bi xwe jî Cizîr nedîtibû. Yanê, ew tişt, ez dikarim bêjim di nav xwîna me de bû. Wextê ez gihîştim Cizîrê, ez nehesyam ku ez çûme cihekî biyanî. Ya rastî şaredarê Cizîrê kak Aydın û hemî hevalên wî pêşwazîyên girîng bo min çêkirin û ez gelek spasiya wan dikim. Li Cizîrê 4-5 rojê mam, ez dikarim bêjim ev 4-5 roj, xweştirîn rojên jiyana min bûn.

- *Te got, bavê me ji me re digot; “rojek bê emê vegerin Cizîrê”. Li gor bîr û bawerîya te ev tişt nêzîk e an na?*

Bawer nakim. Ez bawer nakim, ku ezê bibînim. Wextê ez bimrim, min li Cizîrê veşêrin. Xelqê Cizîrê, gişt daxwaziyek ji min kirin, ku gora Mîr Bedirxan, dê û bavê min Rewşen-Celadet Elî Bedirxan bînin Cizîrê. Ku li jiyana xwe Cizîr nedîtin, bila tirba wan li Cizîrê be. Ji bo vê hevpeyvînê em gelek spas dikin.

- *Gotinên te ya dawî?*

Zimanê xwe biparêzin, zimanê xwe biaxivin, zimanê xwe hîn bibin. Çima? Mirov wextê zimanê xwe winda dike, xwe winda dike. Bavê min digot; “zimanê biyanî, wek cilê mirov e, mirov kêngê bixwaze dikare derxe. Lê zimanê dayîkî wek çermê te ye, tu nikarî derxî.”

Ziman, ziman, ziman.

Ji rojnama (Dema nû)

Hevpeyvîn: Serdar Çolak - Hewlêr

Reva paş Sînor

Su'ad Cegerxwîn

Ev helbest hatiye nivîsandin ,bi pênûsa Su'ad ,keça seydayê nemir Cegerxwîn.



Di derheqa penaberya malbata C.X li kurdistana başûr, di sala 1959z, dema malbatê xwe gihandin bavê xwe yê berî wan di sala 1958 z de koçkiribû , ew şev di hizr bîra keça wîde mabû , wê xwest vê bûyerê bighîne gellê xwe, wek serpêhatîke peywend bi Jiyanaya seydayê Cegerxwîn ve.

şevêk ji şevên , cehzeranê bû
şevêk giran bû ,j'taristanê bû

ez û dayka xwe , Gulperî û Rojîn
Selam û Azad ,Sînema şêrîn

Me da pey şopa , du kurdên rênas
Dilê me bi tirs , bi coş û taswas

Rêça wan da ser , em li pey wan bûn
Ji ber di wê rê , em ê nezanbûn

Her yekî ji me ,armancek hebû
Kes ji me pêve , di wê rê nebû

Sergêj û peyar,dil êş û janin
Em diçin an tèn ,qet em nizanin

Rengê wê şevê ,ez pir hejandim
Dengê kûçikan ,pir ditirsandim

dwazde salî bûm ,gênc û ciwanbûm
ez bê hêvî bûm ,ez bê saman bûm

axek ajotî ,tert û tevlihev
rêçek dijwar bû , geh meş û geh rev

tiştê pir ne xweş ,ew strî û xar

tev bi tirs diçûn , bê pasport û mor
ma para me ye,ev setem û zor

me'j hevalê xwe , sed car dipirsî
ka dawiya rê ,ma tu natirsî

serê xwe d'hejand , her wî xwe d'kenand
ew rêça dirêj, me tevde qedand

em pir êşiyar ,çendî giriyan
Ji pirsê êdî ,ziman westiyar

tirsa polîsa ,kete dilê me
lêdana bavo , hat ber çavê me

Ji nişka heval ,go vaye sînor
em tevde kom bûn , li wî hawîr dor

Ev Maseka ,gundek kurdane
êdî netirsin , ev Kurdistane

malbata Bozê , di gel gundiyan
hatin pêşya me , li me civiyan

em kirin hembêz , d'gel peyvên şêrîn
bi xêr hûn hatin , malbata Cegerxwîn

em pir birçî bûn ,xwarin jî anîn
em pir westyabûn ,livîn wan danîn

em bi asayî ,ketin xewek xweş
ew tirs ferikî , tirsê şeva reş

dema'm şiyar bûn, tev dîsa hatin
stiriyên lîngan ,wan tev kişandin

bi dilekî xweş , wan em hewandin
derd û kulên me , ji dil revandin

lê şeva dijwar ,em ji bîrnakin
çawa tirsê wê, j'serê xwe rakin

ta ez hebim wê , li bîra min bî
gelo wê tehlî , tim para me bî.

Riya hêviyan

Çîrok:

bêrîvan hisên

Destê sibehê çavên xwe ji xewa şêrîn vekir, bi dengê xurt ji derveyî odê hest bû, derket û li pencerê nerî, tê bê xurist di zemawendekê de ye, yan jî tê bê dîn bûye ji wan pelên zer yên bi daran ve , hema dixwaze wan hilweşîne, bi wan pelên dara re ku di weşiyên, Nîrozê bi xeml û xêza wê di hate ber çavê wî.

Ji ber hemû rengên wê keçê ji rengên payîzê bûn. Porê wê...çavê wê...destê wê..lebta wê a giran...tew dengê wê tê bê pelên payîzê bûn û ji daran di weşiyên.

Hema qederê nîv seetekê li ber pencerê ma û di nava xwe de di ramiya, li xwe agahdar bû ku divê derkeve û here nan û xwarinê ji mala xwe re bîne. Hema ser çavê xwe şûşt û cilê xwe li xwe kirin û derket. Lê tu carî bê taştê dernediket, diva her sibeh çayê vexwara û çend çixara bikşîne.

Tenê di vê rojê de wisa derket, bê tiştêk. Ne çayê û ne çixare.

Di nava xwe di got: ezê îro bîranînên nîrozê vexum.

Bi riya nav bazarê de ket, serê wî di ber wî de. Di ber xwe de bi piste pist sitraneke Feyrûz li ser payîzê digot. Erê kêfa wê ji sitranên Feyrûz re dihat.

Çû li ber firnê sekinî, xelk bi ser hevdû de kom bûne û hewar hewara wane, her yek dixwaze berî ê din nanê xwe bistîne. Hema ew jî di cihekî de ji xwe re sekinî û li xelkê dinerî, ne nan li ser bala wî bû, û ne jî deng jê derdiket. Bîranînên wê dihatin ber çavê wî. Bi taybetî dema çûn seyranê li bajarê Efrînê gundê Qerecîrnê. Ê çawa ew û wêna beziyan ber darekê û li ser qurmê darê navê xwe kolan, û di navbera herdû navan de dilek neqîşandin ku tîrek di nava dil re derbas dibe.

Dema ew wisa ew dar dianî bîra xwe û çawa herdwan pala xwe didan wê darê, ji nişkê ve weke ku bayekî xurt li bin guhê wî xîne. Hema di cihê xwe de bi qûn de li erdê ket.

Rabû û li dora xwe nerî, tu çî bibîne hema xelk û dehfan didin hev. Ew jî di nav lingan de maye.

Rabû ser xwe, dît ku heylo ne û nanek li firnê nemaye, û qarwara xelkê gazina dîkin ku çima nan

ne sitendine. Hema wî xwe rakir û meşiya, berê xwe da bazara keskayê. Çû cem erebanakê sekinî û du kîlo petat kirîn û hinek bacanê sor, û kete riya malê de.

Bi rê de sitrana Feyrûz ji bîr kiribû, li xwe di nerî. Du tûrên reş di destê wî de. Mîna gêjan li bin guhê hev diket.

Serê xwe bera ber xwe da, û hêdî hêdî meşiya. Dengê mendalekî li ber guhê ket ji xwe re distra.

bala xwe dayê ku keçmendalek li qiraxa deriyekê rûniştiye û sitranek Feyrûz dibêje:

di havînê de min ji te hez kir

Di zivistanê de mi ji te hez kir

Û çavên te havîne

Û çavên zivistanê

tije ne yarê min....

dîsa sitran hate bîra wî, pala xwe da pala wê keç mendalê û pê re sitra:

havîn bi soza xwe derbas bû

û ba goşiyên xwe dane hev...

hema bi gotina dawî ji sitranê re rabû ser xwe û kete rê...petat û bacanê xwe jî li dû xwe hiştin.

Di ber xwe de got:

Erê ezê îro bîranînên xwe bixum.....

BÊ NASNAME

Kurte çîrok :

Lewend kardoxî

Piştî nûjdarên herêmê dilsar bûn ji nexweşiya kurdo? Berê wî dane nexweşxana şamê. kurdo kete nav xem û amanên kûr de, ji êşa hinavê xwe gelek tirsiyaye. Mirovekî perîşan û belengaze û temenê wî gihiştiye heftê salî.

berî wî ket şamê. tev gelek pere anîn ser cotê xwe. xatir xwest ji malbata xwe û ji gundiya.

xirac qeyda xwe (nasname) pêça bi perçeyk ji naylonê û xist bêrika xwe de. bişkok lê girt , nerînek kûr li gund temaşekir û bi dilekî xemgîn berê xwe da qamişlo li postê siwarbû.

Piştî demeke dirêj û bê xew westiya. gihişte Şama şerîf weke tê gotin.

roj li ber ava bû , ba û baran bû, demekê geriya li kolanan,

nizane bi kûde here, ne kesî nasdike , bi zimanê erebî jî nizane. hinek xwarin şipyayî xwar û ji xwe re got:

-bû dereng û ev bû du roj ez ne ranezame, her êşa min zortir dibe. ji serma û rêwîtiyê ezê herim hotêlê , îşev li wir rakevim û çavên xwe germ bikim, da sibe herim nexweşxanê.

bi nîşanê destan bi ser hotêlekê vebû.

ji nivîskarê hotêlê re got:
 ezê îşev razê, va ji te re pere û xirac qeyda min.
 nivîskar li nasnama wî nerî .!
 jê re avêt!!!! got:
 - ev çi nasnamaye here !!
 kurdo çû gelek hotêlên din lê hemiyana razana wî
 ne dipejirandin.
 carek din vegeriya kolanan.
 êşên wî pirtir dibin! lê bi êşa xwe ya nû diramiya.
 !(êşa nasnamê) .
 beyana sibihê xuya dibe, seqem û serma zor tir
 dibûn. Tu kes li sikaka nemabûn.
 Kurdo bi tenê, bê cih û war ma .ji gerê û sermayê
 êşa hinavan .!
 azara ramanên wî.! ji qereman xistin.!
 cavên kurdo bi avahîyekê ket. dergeh vekirî bû. li
 hundir pêşiya pêpelûnka, serê xwe danî ser zemîna
 batonê û laşê xwe dirêj, kir bê cilik û livîn.
 çawa çavên xwe dane hev..bê ageh ket.
 dem bû sibeh, mirovên avahîyê peya bûn. dîtin
 kalek raketîye , xwestin wî şîyar bikin
 dema nîzîk bûn..! çavên wan bi dev û pozê wî ê bi
 xwîn ket..!
 hin ji wan çûn karê xwe û camêrnan jê rahiştinê
 birin nexweşxanê.
 li ber dergehê nexweşxanê bijîjk û berdest bezîn
 pêşiya wan.
 polîs lezgîn bûn zû emade bûn, lê nerîn, dil û laş
 ezmûn kirin, wêneyê serî û hinavan jê re xwestin.li

wê çaxî polîsan pirsan kurdo dikrin. pîştî encama xwînê derket û wêne sipî kirin. nojdar bang li wan kir û xwest birîn saziyê amade bikin.

- wê ev kal bimre kû em zikê wî aniha venekin. penceşêrê hinav tev her hilandiye, zû wî bibin û nasnama wî bidin jimarkar, da kaxetê derbasbûna nexweşxanê amade bikin.

polîs û berdestiyan bêrîkê kurdo vekirin.... !
tûrikek dîtin...!

vekirin. xirac qeydek dîtin, dane dest hev, Jê diman behetî ...!

serkar û polîsan gotin:

- ev ne nasnameye. em nikarin wî li vir sax bikin, bavêjin derve...!

nûjdarekî ji wan re got:

- ma ev ne mirove.? ne milletê vî welatî ye. ne gunhê wî ye ku ew bê nasname ye. gunehê mezina ye. Serkar li gazindên nûjdar û ahînen kurdo ne hisand.

bi dilekî xemgîn û hestin Şikestî derket ji nexweşmirinê ne ji nexweşxanê..

careke din vegeriya kolanan.

xirac qeyda xwe derxist û got:

- tu ji min re nabe.

kir piç û piç û avête sebeta gemarê .laş li kurdo giran bû ,bêcan ket û dirêjbû.hate ber çavên wî gund û kesên wî ..

dev li ken cavên xwe girtin ji chîhana bê dad ..!

hin ji karkerên paqijiya bajar bi girgiroka kar ew

birin nexweşxanê, lê mixabin ew nexweşxana berê
ye . dîsa nûjdar û berdest bezîn li pêşiya wî, û
ezmûn kirin ,dîtin kû kurdo ye.

lê vê carê miriye.... !!!!

li hev meyzandin û nerînên wan li kurdo digotin :

- me ew kuşt..ew bijîşkê dilovan gelekî girîya û ji
polîs û serkar re got :

- eve wekhevîya we.....!?

eve welat parêziya we ?

eve mirovahiyaya we ?

eve destûra we ! ?

evin sincîyên we ..!!

eve karê we ..?

xelkên welatê me dimirin, li pêşiya me bê sûnc û
guneh !

Eve ...ev....ev...eeeeee. ?

neferkî ji polîsa dest danî ser devê wî !!?

hinek din ew xirxirandin..ew birin mala xaltîka wî.

li berîkên kurdo geriyên ? vê carê xirac qeyda wî
nedîtin .

nema zanîbûn navê wî bitevayî û ji kîjan gundiye û
kîne malbata wî.. wek dizanin, nûçe dane
berpirsyarê mezin.wî beryar da ku wî veşêrin li nav
goristaneke milî û Li ser kêla wî binvîs in : kurdo
yê bê nasname ?!

lê navê wî bi tenê jê re nasname ye ..

xwiya ye... ji milletê kurde ?


kurd bi nav û dîrokin .

Kes nikare wan bê nasname bike.

JI HEVALEKÎ NEZAN RE

Cegerxwîn

Ho hevalê ciwanmêr
Kengî pisîk di bin şêr !
Rista te ya pir ciwan
Pê xweş dibin dil û can
Vaye giha destê min
Ew jî wekî ristê min
Têde êrîş dibî me
Lê nizanî ez kîme ?
Carek here ber ava
Bala xwe bid perava
Latên bilind û mezin
Ev hezar û sed û hin
Her lêdixin çelq û pêl
Lê di cîde dibin kêl
Xwe berdane peravê
Qe guh nedin wê avê
Tu guh mede neyara
Asin dişkî bi dara ??
Dîkên xerzan xwe dan hev



Hê nebûye dema rev
Roja bibî tengasî
Hemî dibin gamasî
Wê birevin ji meydan
Naxwazin herin zindan
Sivik mebe weke wan
Derman nabî ê nezan
Kurdan berê gotiye :
Bibîn pirsî pêşiya
Sê tişt hene bi dil êş
Mirîşk û mêş û derwêş
Raste dilê min têşî
Lê nabim dîkê pêşî
Kundên serê şikêra
Nakevin şûna şêra
Ji pêsa re nabin ber
Weke lîza zo – ma – fer
Bîstê xwe min şandin xwê
Heta roja me jî bê
Xewna pûça hina dî
Wek daxwazên jina bî
Raste îro dizûrin
Lê hê gelek li dûrin
Milet kiyê li cem te ?
Ev çi ware, çi semte ?

Li rojnaman binêre
Kî pisîke, kî şêre ?
Evên gernas û rêzan
Dijûn didane Berzan
Em ji kesî natirsin
Wer ji kesî napirsin
Çiqas xwe bikin wek şêr
Paxer nabî weke zêr
Te xwestiye ku rûnim
Weke kundan bixûnim
Ristên me bûne sê – ga
Eve bilûra ber ga !!
Me nasnekir kulê te
Çi hate ber dilê te
Bi rastî ger bişênî
Tê bersivê bibênî
Gelo dixwazî tevger
Yan jî divê bikî şer
Hê av nehate ser êş
Çiman xwe wer didî pêş ?
Ristên te wek dir û zêr
Lê di navde serê mêr
Tiştê ko te nivîsî
Weke cewher diîsî
Li cem minin xêzên te


Nivîsar û rêzên te
Erîş dibî ser Hemîd
Çi dixwazî ji Reşîd !!
Xwe meke wek nezana
Tu tif meke ezmana
Tiştên pîs û kesnedî
Dibin bela li xwedî
Li nik min pir delalî
Çiman wilo dinalî
Kengî av hate ser êş
Divê hingî herî pêş
Hevalê minê hêja
Guh mede van qirêja
Welat welatê meye
Meydan gelek fireye
Ji dil bavê gir û kîn
Dibî dostê Cigerxwîn .

Ji dîwana (8) an.....

Zemawenda diwem

helbest :

Yasîn Hisên



Her yekem hêstir ji bo te ye
her ew kelên girî dibûn henek
di sîh û şeş newrozan de
çar yezdanan zemawendên xwe li
cihekî dûr li dardixistin....

û name bi dû namê de
destên min diqefilîn....
qêrîn bi dû qêrînê de
ez diwestiyam
ji lavêjên beht
dema lêvên te lava dikirin....
tenê dema ez di yekemîniya te de,
min tu himbêz dikirî
tu bêdeng dimayî...

ker.....lal.....gêj
nalîna yezadanan

û pûştên bihuştê bi te diketin
çiko lêvên te sorahiya xwe ji êgir girtibûn
memikên te
şîrê helbestan bû...
lingên te...! di riwê yezdan de diqîriyan

Ey keça bêhûde
de bi xwe re min bifirîne
min di bin çengê xwe de biguvêşe
da mîna mindalan
hihitokan di landika min de birêse
û her şev bi dû şevê de
zemawenda siyem di dilê min de
har bike.....

Çima kevokê ?

Helbest:

Şivan Qelew

Ser doşeka xewna
Di himbêza tariye de
Bê deng bûna şevê
Aloziya mêvana min
Ez xistim dergûşê
Dihejiyam...
Dihejiyam...
Tî bûm digriyam
Ji nû ve çêbûm
Ew keç perîşan bû
Ne bi xwas bû lê tazî bû
Hêdî hêdî dimeşiya
Pirç û mijgul weşiyar
Herdû çavê min dikuliyar
Sîber dînbû bi çolê ket
Ew reng bi rastî pê ket
Bê xwê û nan derket

Nîzîk bû gelekî
Lê...
Lê teq teqek hate min
Yek bi hêdî
Yek bi xurtî
Çav min vekir
Wê kevokê bi nîklê xwe
Li pencera min
Hîna dixist

www.arsivakurdi.org

JI MIN BAWER BIKIN

Helebest:

Dildar Ismaîl

Bawer bikin ji min
Wê evîna min şîn bibe
Dem xwe vedigerîne
Min dabû te dil û ceger
Te dida min çavên şil
Rondikên hêstira
Dêman dike birîn
Xwe berdidin nav damarên
Can û cegerê min de
Gnehê min çi bû.....?
Ji keleman nayê parastin
Xwîna min ji çi bû
Ku nayê zelalkirin?
Bera di ber belbelîskên
Hinavên te de jar bibim
Li ber kenê lêvên te har bibim



Bê oxir ji bîr nakim
Dêmên lihevhatî û pora berdayî
Ken winda dibe
Ji dûrbûna dengê te
Dikim fîxan di tariya şevan de
Can ji hev venahese
Ji kerba evîna roj û şevê
Çav ranakevin ji Hêstirên zuha
Bawerbikin evîn buhaye....

şeva çûbû

Suad alsabah

Wergerandin ji erebî : Ismaîl kose

-1-

şeva çûbû

Min xewnek dît

Ku ez bûme sumbil

Di çolên sînga te de

Tirsiyam xewnê ji te re bêjim

Ji bo tu min nebe cem nangehê bajêr

Û min neke nanekî germ

Tu min bixwe....

-2-

Şeva çûbû min xewnek dît

Ku ez bûm masiyek

Di ava zelal a çavê te de

Avjenî fikir

Tirsiyam xewnê ji te re bêjim

Ji bo tu mijankê cave xwe li min negre

Û tu min bifetisîne....

-3-

Şeva çûbû min xewnek dît
Ku ez helbestek bûm
Di bêrîkek te de veşartiyê
Tirsiyam xewnê ji te re bêjim
Ji bo ku tu min nede weşanxaneyekê
Û tu min bi qebhet neke....

-4-

Şeva çûbû min xewnek dît
Ku ez ramidandî bûm
Li bin dara evîna te
Û tu şîrê çûka dide min
Tirsiyam ji te re bêjim tiştê min dît
Ji bo tu neke bi ramanên min
Û tu sindoqa xewnên min neşkîne....

Çend Helbestên Yabanî
{ Hayko }
wergerandin ji erebî: Ciwan Nebî

{Gîto}

Wilo û bi spasî
û weke ku li pirtûkeke pîroz binihêrim
li rojnameyê dinihêrim.

{ Bozon }

Ez dixwazim li vir
di bin gulê qurunfulan de serxwş bikevim,
li ser vî kevrî vehesim.

{Paşo}

{Onîtsora}

Û em her du
hîna dijîn
çawa bahoza payizê dibare?

{ şîkî }

Heyveke hilab û bi ronî
û şevê tevî
ez li der dora goltika xwe ya biçûk dizîvirim.

{paşo}

Diz bi tenê
heyva min a delal
ji min re di pencerê de hişt.

{Riyokan}

Ger yekî destikek
ji heyvê re danîba
wê biba bawêşînekê destan.

{Sokan}

Ew gula ji şax weşiyayî
û dîsa veşiyayê de
ew pîrpirîkek bû..!

{Morîtak}


Di bin heyva bi ronî de
ez bi sîka xwe re
vedigerim malê.

{Paşo}

şev tarî ye
Wilo jî mirov dikare dengê heyvê
di banga balindeyê şevê de bibihîze.

Gotinên pêşiyar

- Benîştê dînan bi lîtiran e.
- Bi ya ker manker horî ye.
- Bertîl keviran nerm dike.
- Bi werîsê dînan xwe bermede binê bîran.
- Dengê diholê ji dûr ve xweşe.
- Deve bi kodikê nayê avdan.
- Devê rovî negihîşt tirî got tirş e.
- Dewar mekire li nîsanê, jinan hilnebijêre li dîlanê.
- Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çêtir e.
- Dil şûşe ye, ku bişikê nayê cebirandin.
- Ez dixwim nan û avê, min mineta kesî navê.
- Fermana devan derket roviyan baz da.
- Golikê malê ji gayê malê natirse.



- Gur bi du pariyan namire.
- Her giha li ser koka xwe hêşin dibe.
- Her teyr bi refê xwe re di fire.
- Ji çavê kor hêstir nayê.
- Ji dilê xweş re her tim bihar e.
- Kes nabêje dewê min tirş e.
- Kevir navêje kûçikê xwe ku cîran jî navêjin.
- Mar nabin yar.
- Mirov ji mitriban dew napê.
- Pîrê memire bihar tê, kero nemire qîvar tê
- Rûyê beq di avê de şil nabe.
- Tu çi têkî kewarê ew ê bê xwarê.
- Xwedê goşt dide mirovê bê diran.
- Zikê têr hay ji yê birçi nîne.

Pêkenok

JI JINA XWE NATIRSE!

Li qahwê yekî ji hevalên xwe re got:

- Yê ku ji jina xwe ditirsin bila hemû rabin pîya!

Yek ne tê de hemû rabûn pîya. Ji yê ranebûyî pirsîn:

- Welê xuyaye ku tenê tu ji jina xwe natirsî?

Mêrik:

- Na welle, jinikê vê sibê darek welê li kulêmeka min xistîye ku ji êşa wê ez nikarim rabim ser xwe!



EZ MEYMÛN NAXWAZIM!

Mîrovekî ji xwe re jineke dewlemend anîbû. Rojekê ji jina xwe pirsî:

- Erê, te li mala bavê xwe wexta xwe çawa derbas dikir?

- Bi meymûnê xwe.

- Yanê tu dixwazî, ez jî ji te re meymûnekî bikirim?

- Na, tu li ba min î, bes e!



DEREWÎN



- Te di wê bîrê de çi dikir?
- 30 sal berê seeta bavê min ketibû vê bîrê, min jî îro derxist, tu tiştêk pê nehatîye, her wekî agir kar dike!
- Îcar ew çi ye! Ê min, bavê min 30 sal berê ketibû vê bîrê, me derxist hê jî sax bû!
- Errrik, çi derew!
- Na ne derew e. Çimkî bavê min di bîrê de seeta bavê te qurmîş dikir!

LAWIK HÊDÎ DIMEŞIYA!



Mamoste ji teleba xwe ya keçikî dipirse:

- Tu ji bo çi dereng mayî?
- Mamoste, gava ku ez dihatim mektebê lawikek li pey min bû, hema bela xwe di min dida, ji ber wê ez hinekî dereng mam.
- Ê te jî lez bikira?
- Lê lawik hêdî dimeşîya!

Mamik

Ji Folklor a kurdî

Sed mal bi sed sikakê, tev li ser milê gakê.?
Qam tune, kum şîn e, çavbeloq e, lê nabîne.?
Tiştêk e ku di dev re dixwe û ji dev re derdixe ?
Dawî digrin, devê xwe vedikeş
Tenûra himhimî, tije nanê genimî?
Xişt û mişt, çû li quncik rûnişt
Timî dizire, ji bavê xwe mezintire?
Di rêzê de keriyekî pez, hema hema dikin lez?
Pelên wê nayên xwarin, lê koka we tê xwarin?
Dotil e ne satile, çar çembil e ?
Bûk li hundir e, porê wê li der e ?
Ji hingiv şêrîntir e, ji risasê girantir e?
Tu carî têr naxwe, bê av tiştêkî nake?
Dinya tev dirê, baqek giha narê ?
Li wî alî mil, li vî alî mil, di navê de yeke bêaqil ?
Tep li ser tepek e, tê de marê gezeke, li ser du gulên
rûviyê, surek li serê rabûye ?
Gayê sorê serberdayî, di gelî de berdayî ?
Kaniya li nizarî, min û hakima jê vexwarî ?

Çima jiyana Cegerxwîn ya siyasî tê veşartin ?

Ibrahîm Xelîl

Ev bû 24 sal , ku seydayê me yê nemir û hêja mamoste Cegerxwîn ji destê me çû ser dilovaniya xwedê , lê hê ta niha jî weke mirovekî bi canê xwe di nav me de dijî .

Û ji wê demê de ta niha bi dehan civînê rewşenbîrî li ser hunerê wî rûniştine, û bi dehan pirtûk li ser jiyana wî çap bûne, û bi dehan festîvalên hunerî bi navê wî hatine li darxistin .

Lê mixabin di nav van hemî çalakiyên ku hatine li darxistin, hîna seydayê cegexwîn cihê wî ne hatiye dîtin, û weke ku mamoste (*Ibrahîm Mehmûd*) nîşan dide, bi bêtir ji carekê, ku mirovekî bi bejna Cegerxwîn hê ta niha ne hatiye naskirin .

Ji ber ku ew hunerê wî bi tevayî çî helbest û çî çîrok û şano û nivîsandinên dîrokî bi çavên rexne lê ne hatiye nerîn.

Lê ez jî di bêjim ku nenaskirina me ji seyda re ne bi tenê ji ber vê sedemê ye, lê ji ber ku li ser jiyana wî ne hatiye rawestandî û bi taybetî jiyana wî ya



siyasî, ku weke xebatkarekî di nav tevgera siyasî û netewî ya kurd û bi taybetî di nav **Partiya Dîmoqratî Pêşvero ya Kurd li sûriya** de, ku bû endamê komîta navendî û ma ta çû ser dilovaniya xwedê (25 sal) .

lê mixabin ku ew kesê ku vî parçeyê giring ji jiyan û dîroka seydayê Cegerxwîn didin veşartin sedemên wan jî hene, û ew sedem jî eger em bi paqijî lê binêrin ne di cihê xwede ne, wek ku dibêjin seyda ne yê partiyekê ye lê seyda yê gelê kurde, û ev gotin raste lê seyda wek mirov ji mafê wî bû ku bibe xwedî biryar û nerîna xwe bibêje, ta di nav helbestê xwe de weke helbesta di dîwana 8an de (Aştî) ya bi navê (ji hevalemî nezan re) , dema ku pesnê partiya xwe û hevalên wê yê xebatker li dijî êrîşên bê bextî ku li dijî wan peydabûn .

Û ew veşartina dîroka Cegerxwîn di be sedemek ku ji buhabûna wî kêmkirî weke mirov , ji ber ew dîrok parçeyek bi hev girêdayî ye , mirov nikarê parçê ku dilê wî dixwazê bi dê nîşan bibêje û parçê bê dilê xwe bi dê veşartin , bi rastê ev kar bê wicdaniye .

Ma gelo ev kes na pirsin çawa Cegerxwîn bi wê hunera zengîn ya ku bi piraniya wê li ser êşa ku miletê kurd tê de derbas di be û di nav wê hunerê de riya çareserkirina doza miletê xwe daye nîşan , wê çawa ew kes li dûrî karê siyasî be û dûrî tevgera kurdî be ?

Cegerxwîn xebatker bû , û yek ji endamê partiyek kurdî bû ,(Partiya Dîmoqratî Pêşverû Kurd Li Sûriya) û ev rastî nayê veşartin

Û ji ber wê xebatê, gelek êrîş ser wî peydabûn, çî ji destê sitemkarn û dijmina û çî ji destê xêr nexwazên ku di nav tevgera kurdî de hebûn , û ji ber wê jî di astengiyan de jiyana xwe derbas kir .bi girtin û zindan û dûrxistin ji welatê wî û di jiyaneke hejar û belengazî de ta ku hevalên partiya wî alîkariya wî bi kar anîn ji bo seyda bi karibê xebata xwe berdewam bike .

Her weha jî, yek ji xebatên wî yê giring damezirandina yekemîn kovar bi zimanê kurdî di nav partiyên kurd de li sûriya kovara (Gulistan) ku di sala 1968 derxist . û pir xebatên din jî hene, li ne cê vê mijarê de ne .

Ev veşartina ku dibe ne bê gunehe ji ber ku hinek kes naxwazin bi bêjin : Cegerxwîn hevalê Partiya Pêşverû ye û ew vê rastiyê pir giran di bînin .

Lê nikarin vê dîroka zengîn bidin çewtkirin û her weha wê karê seyda û dîroka wî bimîne nîşana xebata wî, çî di nav hevalên wî de yan jî dinava gelê kurd de bi tevahî.

Naverok

Gotar	Niv,skar	R/pel
Şîna cegerxwîn	Henefî çelebî	3
GOTAR ? L>KOL<N		
Bi zimanê xwe bixwîn	Selman Heso	6
(zîgara erebî) .. herifandinê	Elî Şemdîn	9
Ez çûm welêt	Silêman demir	16
Bajarê cizîra botan	Konê reş	20
Zar û ziman	Arşek baravî	24
Zanebûna bi zimanan fêdeye	Zana xanê	30
Gotarok	Azad piling	32
Hekîmê luqman kî ye?	Mizgîn hemo	34
Hevpeyvîn		
Sînem bedirxan	Serdar çolak	36
çîrok		
Reva paş sînor	Suad cegerxwîn	44
Riya hêviyan	Bêrîvan hisên	47
Bê nasname	Lewend kardoxî	50
HELBEST		
Ji hevlekî nezan re	Cegerxwîn	54
Zemawenda diwem	Yasîn hisên	58
Çima kevokê	Şivan qelew	60
Ji min bawer bikin	Dilda ismaîl	62
Şeva çûbû	Suad alsabah	64
Helbestin yabanî	W: ciwan nebî	66
Gotinên Pêşya . mamik . pekenok . Gotina dawî		
Gotinên pêşya	Folklor	68
pêkenok	Gulistan	70
mamik	Ji filoklora kurdî	72
Çima jiyana Cegerxwîn ya siyasî tê veşartin ?	Ibrahîm xelîl	73

